Zanyariyên biroj li ser SocialCard'a Hambûrgê – Zanyariyên taybetî wergirên sûdên li gorî Qanûna Sûdên Penaxwazan (AsylbLG)

SocialCard çi ye?

SocialCard cûreyeke **karta krediyê ya Visa** ye ku bêyî hesabê pere-razandî dixebite. Bi vê kartê îmkana destragihîştina bilez û xwerû bo sûdên pereyê perat ên li bin "Qanûna Sûdên Penaxwazan" tê dabînkirin. Derdem piştî razandina pere di kartê da, tu dikarî wê bi kar bînî.

SocialCard'ê sînordariya krediyê tineye. Derfeta veguhestina pere ji SocialCard'ê bo hesabên din an jî îcadkirina veguhestina deyn a rasterast bo SEPA'yê tineye.

Tu dikarî SocialCard'ê wek **karta fîzîkî** û heta bi **Jîrefonê** bi kar bînî. Ji bo bikaranîna SocialCard'ê li jîrefonê, divê te pêştir hejmara telefona xwe ji "Rêveberiya Koçberiyê" ra raber kiribe.

Zanyariyên giştî li ser SocialCard'ê û şêwaza bikaranîna wê li jîrefonê dikarî li vir (malpera raberkera Publk GmbH) bibînî.

Kî SocialCard'ê werdigirin?

Eger yekem dora peredana bo te, li gorî "Qanûna Sûdên Penaberan" **piştî** 15ê Sibata 2024an bûbe û tu nîştecihê **Navendeke wergirtina seretayî li hambûrgê** bî, SocialCard dê ayîdî te be.

Eger piştî wergirtina SocialCard'ê ji navenda wergirtina seretayî hatibî derketin, dikarî SocialCard'ê û hema wisa li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" pere wergirî.

Eger te pêştir, **beriya** 15ê Sibata 2024an te li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" pere wergirtibe, SocialCard ayîdî te nabe, heta eger nîştecihê navenda wergirtina seretayî bî.

Çawa pere bo SocialCard'ê tê veguhestin tê veguhestin?

Eger te SocialCard wergirtibe, "Rêveberiya Koçberiyê" bi awayê otomatîk û dîjîtal pere vediguhezîne SocialCard'a te.

Ji bo razandina mehane ya pere li SocialCard'ê, serdana bo rêveberiyên hikûmî an amûra ATM (amûra xwe-pereder) dê pêwîst **nebe**. Hewcetiyek bi serdana bo Rêveberiya Koçberiyê an ofîsa navçeyê jî dê tinebe. Êdî pereyê perat anku neqt heta li ofîsa peredana next a rêveberiya navçeyî ya Wandsbek'ê raddestî te neyê kirin.

Li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan", gelo ez dikarim pere li dewsa SocialCard'ê li hesab an bi awayê pereyê perat û neqt werbigirim?

Na. Pereyê li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" **tenê** di rewşekê da li SocialCard'a te tê razandin ku yekem dora peredana bo te, li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" piştî 15ê Sibata 2024an pêk hatibe û tu di wê demê da nîştecihê navenda wergirtina seretayî bûbî. Jêdera din a têkildar pere venaguhezîne hesabê kesan û pereyê perat jî nade.

Tu dikarî serbixwe ji SocialCard'ê li bankê hesabekî vekî. Wek mînak eger tu dişuxilî û sûdên din li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" ayîdî te dibin, dikarî hesabekî bankê vekî. Helbet, pereyên li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" tenê bo SocialCard'a te tên veguhestin.

Her malbatek çend SocialCard'an dikare wergire?

Her kesekî mezintir ji 18 salî, pêkhatî ji zarokên **mezintir ji** 18 salî yên malbatê, dikare SocialCard'a xwe ya kesane hebe.

Pereyê têkildarî zarokên **bin** 18 salî, li SocialCard'a dayîk an bavî tê razandin. Biryardana di vî warî da li ser ustiyê te ye.

Ez kengî dikarim ji bo SocialCard'ê daxwaza xwe raber bikim?

Tu dikarî li firoşgehên hertimî yên Almanyayê (weke sûpermarketan û dikanên din an jî navendên raberkirina xizmetan weke barber, Deutsche Bahn û...) SocialCard'a Hambûrgê bi kar bînî.

Bikaranîna SocialCard'ê li derveyî welêt an li Înternetê ne pêkan e. Her wiha ev kart ji bo karûbarên veguhestina pere an xizmetên pereyê perat û neqd, kirîna Karta Xelatê an lîstina qumarê bi kêr nayê.

Peredana bi SocialCard'ê li navendên wergirê Kartên VISA pêkan e. Bala xwe bide sere logoya VISA li firoşgehê an jî ji berpirsên firoşgehê bipirse!

Gelo ez dikarim ji SocialCard'ê pere rakim?

Her kesekî mezin (18 salî *û* mezintir) dikare her mehê 50€ pereyê neqd rake.

Pişka mehane ya rakirina pere ji bo kesên biçûk (*bin 18 salî*), 10 € zêdetir ji pişka kesên mezin e.

Rakirina pere bi amûra xwe-pereder anku ATM'ê (bi karmizd) û li firoşgehan (belaş) pêkan e. **Her dora** rakirina pere ji ATM'ê 2€ karmnizda wê heye. Ji bo ku bizanî ku rakirina pere bêyî karmizd li kîjan navendê pêkan e, serdana vir bike. Ji bo rakirina pere li firoşgehê, pereyê kirîna te bi giştî divê herî kêm 5-10€ be.

Eger tu ji navenda wergirtina seretayî derkevî (û her cihekî din ê mayînê an jî di rewşa istîsna da, te destûra jiyana serbixwe wergirtibe), heta wê demê ku sînordariya krediya te bi dawî nehatibe, te yê sînordariya rakirina pereyê neqd tinebe.

Bikaranîna SocialCard'ê dibe ku çi lêçûnan bisepîne?

Raberkera kartê dibe ku lêçûnên jêr ji bo te berçav bigire:

Ji bo rakirina pereyê neqd:

- Belaş bi kirîna ji firoşgehê. Pereyê herî kêm ê kirrînê divê 5-10€ be. Ji bo ku bizanî ku rakirina pere li kîjan firoşgehan pêkan e, serdana vir bike.
- 2.00€ ji bo **her dora** rakirina pere ji ATM'ê.

Ji bo peredana li firoşgehê.

- Belaş **heta** 20 dorên peredana di mehê da.
- €0.08 Ji bo **her dora** peredanê ji dora 21 Di mehê da

Di rewşa istîsna da, dibe ku ji bo babetên xwarê karmizda zêdetir were sepandin:

- Destûra peredanê ya kêşeliser: 20.00€ (serdana vir bike li girêbesta bikarêner di rûpela 3 beşa "Vekolandina destûrên Peredanê yên Bicihnehatî an şaş-bicihhatî").
- Vegerandina pereyê nepejirandî: 25.00€.

Ez çawa fehm bikim ku heyîna (mayî) karta min çiqasî ye?

Tu di her demekê da dikarî krediya xwe ya mayî bi sepana Secupay she bikî (zanyariyên zêdetir ji vir) wergire) an jî tu dikarî vî karî bi awayê serhêl pêk bînî. Serdana beşa Zanyarî ji bo bikarênerên SocialCard bike.

Eger ez sûdên AsylbLG wernegirim, dê çi bê serê SocialCard'ê?

Eger êdî li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" pere raberî te neyê kirin, dikarî kartê hema wisa ragirî. Helbet êdî ti pereyek li kartê nayê barkirin.

Baştir e ku krediya xwe ya mayî herî zû mesref bikî! Ku wiha nebe, dê lêçûneke bi qasî €1.50 di mehê da li ser tê were sepandin.

Êdî ti hewcetiyek bi vegerandina SocialCard'ê tineye. Tu bixwe dikarî wê bavêjî nav zibildankê.

Wek mînak, eger di pêvajoya daxwaza penaberiyê da rewşa penaberiyê raberî te bê kirin, derhateke guncan bi dest bixî, an jî ji Jobcenter'ê sûdên welatîbûnê wergirî, êdî li gorî "Qanûna Sûdên Penaxwazan" ti pereyekî wernegirî.

Zanyariyên zêdetir li ser malpera raberkera kartê (Publk GmbH) û li beşa şert û mercên bikaranîna SocialCard'ê. ***Helbet, bila haya te jê hebe ku ssînordariyên pêştir-gotî li Hambûrgê tên sepandin (qedexetiya bikaranîna li Înternetê an derveyî welêt; sînordariya rakirina pereyê neqd).***